
Bekîr Yildiz

# ORDÎYA MÊŞÊN HUNGUV



Weşanxana Çanda Kurdî

**Bekîr Yildiz**

# ORDÎYA MÊŞÊN HUNGUV

**Weşanxana Çanda Kurdî**

Kurdiska Kulturförlaget / Weşanxana Çanda Kurdî
Box: 161 39, 103 23 Stockholm - SWEDEN

© Bekîr Yildiz
Wêne: Ismaîl Gülgeç
Wergêr: Şerefnaz
Çapa Kurdî: Weşanxana Çanda Kurdî 1990 - Swêd

ISBN 91 861 46 32 7
Bohusläningens Boktryckeri AB, Uddevalla 1990

*Ez li welatê Nemrût hatimê cîhanê. Dema ez biçûk bûm, mezinên min, efsaneya Nemrûd digotin. Piştre ez mezin bûm. Heya demeke nêzîk jî min bawer dikir, ku Nemrûdê zordar, berî sed salan jiya ye û miriye. Lê, îro têdigihêjim ku zordarî ji ser rûyê erdê ranebûye. Bi ser de jî hîn pirtir bûye û li walatê ku ne tenê Nemrûdek jiya ye, bi hezaran Nemrûd jiya ne mafir hûn zarok dê paşarojê çêbikin, tiştên ku ez û nifşa min, em bi mezinayî fêr bûn, divê hûn biçûkayî fêr bibin. Nemrûd li gelê xwe gelek zor kiriye. Ez ne tenê vê yekê dibêjim, dixwazim bibêjim tevî ku Nemrûd pir xurt bû jî, mêşeke hungiv a qop, ew kuşt. Min ev karê dijwar û giran mîna di efsanê de hatiye gotin bi kerametan ve girêneda. Ji ber sedsala me ne a kerametan e. Mirov dikare bi xebat û zanîna xwe, ji kerametan pirtir tiştan bike. Lê divê mirov mercên serketinê ên bingehîn bizanibe. Di sedsala me de mercê serketinê ê pêşî pêkanîna yekîtîyê ye. Deng ji destê bi tenê dernayê. Zarokno, de werin, em bi hev re vê çîrokê bixwînin û ji bo pêkanîna rojên bê Nemrûd biramin.*

**Bekir Yildiz.**

Ez mêşeke hungiv, bazqop û kujarê Nemrûd im. Ew Nemrûdê ku sîdarê heft çiyan û heft deştan bû. Heya bi hespê wî, ne mîna hespên ku hûn dizanin, bû. Ji xwe hespê wî yê ku piyên wî ên pêşî kin bûn li cîhanê bê hempa bû. Ji bo daketinê jî hespek wî yê ku herdu piyên wî ên pêşî mîna ên zirafa dirêj, hebû. Min bi çavên xwe ew hesp dîtin. Dema ew, li çiyayê Tektekê beşdarî şahiyekê bûbû, ez jî li ser pejikekî veniştibûm. Hat û di ber min re derbas bû. Ji ber ez bi bazkekî bûm, min nikaribû bifirim û bigihêmê. Lê ji xwe dipirsî ma kuştina Nemrûd hêsan e? Carekê difiriyam hezar caran diramiyam.

Heger tiştên bûyî ji we re bikim çîrok hûn dê şaş bimînin. Wê gavê merheba û fermo ji we re, bi hêviya ku hûn carekê şaş bimînin û hezar caran biramin.

Nemrûdê desthilatdar ji hemî desthilatdaran mezintir bû. Nav û dengê wî ê ku gihaştibû heft çiyan mirovên pişt çel çiyan ditirsand û dilerizand. Mebêjin mafir mirov ji tirsa wî dilerizîn, êdî peyv ji mozeke mîna te a bazqop, re dikeve. Moz, moz gotiye; mirov mirov gotiye. Lê gelo her mirov, mirov e, û her desthilatdar jî mîna Nemrûd e? Na bi rastî jî her desthilatdar mîna Nemrûd in.

Pirî caran digot, ez xwedê me, û dixwest wê bipesirîne. . Ezmanê Rûhayê bi çerman ve digirt û li cîyê dilê wî dixwest baran dibarand. Rojekê jî li hespê xwe yê ku difirya suwar bûbû û çûbûbû ezmanan. Xelkên temaşeger ên ku li deşta Heranê a vekirî li wî dinêrîn, baweriya xwe bi çavên xwe ne anîbûn. Dema ji ezmên daketibû jêr, şûrê wî bi xwîn bû.

Çawa bi pesin û şanazî gotibû: "Ez çûm ezmên, min xwedê kuşt"

Dema merivan baweriya xwe bi gotina wî anîn û li ber wî destbestîn xwar bûn, em mêşên hungiv ew çend matmayî mabûn ku... Me di nav bera xwe de digot, di vî tiştî de de-

kek heye,

Lê çi ye me jî nizanibû û bi rojan em ramiyabûn.

Bi rastî di nav me mêşan de jî wek hevî nîne, Mêşên xebatkar bi makê ve girêdayî ne. Serdara me, maka rojekê em civandin.

Got: "Ax ev mirov çawa ne? Di cihê ku li ser rastiyê rawestîn, pir caran dibin qûlê xeyalan."

Em matmayî bûn. Vîzînî ket nava me û em di ciyên xwe de lebitîn. Maka me bişirî û got:

"Heger xebatkarên mîna we ji xwe re xeyalan çêbikin, dîsa jê re rê heye. Ma ji bo Nemrûd jî riya xeyalan heye? Lê hûn de bibînin ji rûyê van xeyalan, çi bela dê were serê wî.

Bi baskê xwe ê qop, bi zorê ez firiyam û min xwe gihand nêzîka makê. Dîsa min carekê guhdarî kir, hezar caran ramiyan.

Nemrût li saraya xwe ya derîhesinî û bi zêrneqişandî, ji nav nivîna xwe a hevrişimî ku bi perên çûkan dagirtî ye, çeng dibe. Kî rûyê wî dibîne ji tirsa dibe qasê lepekî û ji ciyê xwe nalebite.


Dibêjin:: "Nemrûdê me, bera rûyê te bikene. Tenê bera rûyê te bikene, hemî te ji te re bibin gorî."

Nemrûd mezinên sarayê li hev dicivîne û ji wan re xewna xwe dibêje. Bi gotina xewna xwe re waha hêrs dibe ku, ji qîrîna wî, bazkên moz û pirpirikan ên ji hevrîşîm teniktir dilerizin.

"Ji nuha çêtir dem nîne. Divê ji îro ve em dest pê bikin. divê zarokên pêçekê ên kûr bêtin kuştin. Jinên avis hemî ji bajêr bêtin avêtin."

"Bera bêtin kuştin û avêtin serdarê me, bera zarokên me jî ji şikên te re bibin gorî..."

"Xwedê giravî lawikek dê çêbibe, mezin bibe û ew dê bi destên xwe min bikuje. Zarokek ha? Lawekî ku ji mirovan



çêbûye... Dê min, dê Nemrûd ha!... Bera zarokên ku çêbûne û ên ku dê çêbibin nemînin."

Naveroka xewnê ev bû xwedê giravî lawekî nûh dê çêbûbûna di demeke nêzîk de bibûna hoya mirina Nemrûd..."

Hemî zarok, heya bi ên şîr dan ber devê şûran, dengê kilamên şîna diyan di ser deşt û çiyan re derbas bû gihaşt deryayan. Bi wî awayî li welatê Nemrûd, ne dengê avekê ne jî ê çûkekî hat bihîstin. Ez ji tirsan ketim şikeftekê, ji herdu çavên min hêsir dadiketin. Bazkê min ê mayî jî mîna ku ji cihê xwe biqete dilerizî.

Tarî ket erdê. Li derûdor deng nema. Lê hîn dengê xirexira Nemrûd a bi hêrs dihate bihîstin. Diqîriya û digot.

"Ez û saraya min nemir in, divê hemî zarok bêtin kuştin."

Di vê navê de dengek berbi guhê min ket, min hîn pirtir xwe di ciyê xwe de veşart. Ji deriyê şikeftê yek derbasî hindur bû. Kurekî nuh çêbûyî hembêz kiribû. Sed caran, hezar caran kurê xwe maç kir. Ji bo Nemrûd wî nebîne, nekuje kurê xwe danî nêzîka min û derket çû.


Min nexwest bitirse û bigirî. Lê ji bêhngirtina mozê çi dê derkeve?... Dîsa jî min nedixwest bêhna xwe berdim. Hew bera zarok hişyar nebûna, şiyar nebûna ku nedana girî. Negiriyana ku Nemrûd dengê wî nebihîstana, dengê wî nebihîstana ku ew nekuştana...

Li me bû sibe. Dema rohniyê xwe bera şikeftê da, min ew, wî jî ez dîtim. Pêşî em bi hev re bişirîn piştre jî em pêk ve girîyan. Meriv tênagihê çawa dibe, weke ku ez zarokek, ew jî mozek bû.

Piştî hinekî ji şikeftê, pezeke kovî derket û hat. Bi wî awayî em bûbûn sê zînde.

Pezkoviyê guhanên xwe avêtin devê zarokê biçûk, zarokê şîr mêjand.

Meh û sal derbas bûn. Ez, moza bozqop, kurê rêwî, pêzkoviya bê cîh û war, em hersê bûn destbirak. Navê



min bû Yekbazkê, navê lêwik bû Bîlge. Navê pezkovî jî Zane bû.

Şevekê Bîlge derket devê şikeftê rawestiya. Ez jî firiyam çûm, min li nêzîka wî danî.

Bîlge got: "Yekbaska min, ji xwe re li vî ezmanî temaşa bike."

Min li ezmên nêrî. Di nav tariya şevê de gilokeke rohnî xûya dikir.

Min bersîvand. "Min dît".

Wî got: "Nabe ku Nemrûd nemir be. Heger desthilatdarekî nemir hebe, ew jî ev rohniya han e."

Bi dilxweşî ez hinekî din firiyam. Bîlge hinekî din li rohniyê nêrî, min jî lê nêrî. Me ew rohnî bi navê heyv navand. Me got ya, destê sibê heyv çû ava û ji ber çavan wenda bû. Piştre îcar em ji şikeftê derketin ji pişt çiyayê hember me, gilokeke rohnî ya din ber bi çavên me ket.

Bîlge got: "Em şaş in. serdarê nemir ne heyv e. Hebe nebe nemir ev giloka rohniyê ye. Bi ser de ev mezintir û rohnîtir e."

Me navê wê rohniyê jî kir roj.

Ez yekbaskê, Bîlge, pezkovî, Heyv û Ro... Min xwest herim ji makê bizanibim, ka gelo mana van tiştên bûyî çi ye?

Bilgê gote min: "Min tenê mehêle. Em bi hev re derkevin nav bajêr."

Min gotê: "Mafir tu natirsî baş e."

Wî li min vegerand û bersîvand: "Payina bi armanc ji tirsê xerabtir e. Divê em zora tirsê bibin".

Hîn Bîlge ne gihaştibû panzdeh salan. Ji ber rohniya tavê çavên xwe girt û vekir... Ji şikeftê derket. Ez jî li rex wî difiriyam. Li kolanan kesek tunebû. Mal vikî-vala bûn. Em herdu destbirak li vî bajarê vikîvala bi seetan geriyan.

Tenê carûcaran ji dûr ve hin deng dihatin. Piştre me bihîst ku li dervî bajêr şahiya Nemrûd hebûye, îro herkes





çûbû wir.

Em ketin hundurê avaniyekê ku deriyê wê ê hesinî heya piştê vekirîbû. Li hundur bi sedan pût hebûn.

Bîlge serê xwe hejand:

Got: "Yekbaska min, ma tu serwext bûyî? Ev olgeha wan e."

"Heyv, Roj?"

Got: "Waha dixûye, li vir bêyî Heyv û Royê, hinên din jî hene. Divê cîhan warekî pir mezin be. Dibe ku cîhanên ji cîhanê mezintir jî hebin? Lê netiştbûna pûtan li ber çavan e."

Piştî Bîlge gotina xwe qedand, bivirek girt destên xwe û dest bi şikandina hemî pûtên olgehê kir.

Ez tirsiyam. Min xwest ji wir birevim. Lê ji ber dostayiya me a bi salan, destên min ji wî nebûn. Û ez mam. Min xwe da qozîkekê û temaşe kir. Bi rastî ez ne bi kira wî re bûm û ji bo wî serwextî vê helwesa xwe bikim, min pişta xwe da wî.

Bîlge, hemî xwedanên pûtî perçe perçe kirin. Dest, pî û serê xwedanên pûtî bibûn, piçûparî Bîlge westiya.

Bivirê wî li ser çoga wî û bêhna wî a çikyayî diçû û dihat. Min dixwest em li hev bên.


Min ji wî pirsî "Bîlgeyê min, ji ber ku ez beşdarî kira te ne bûm, ji min aciz bûyî?"

Bêhnçikyayî bû, got: "Heger tu serwextî rewşê bûyî ne xem e."

Min li wî vegerand: "Heger bibêjim ez ser wext bûme, dê ne rast be".

Wî got: "Mafir waha ye, tiştekî ku tu rastî an çewtiya wî nizanibî, nabe tu li ser bazaran bikî û ji bo wî tiştî bi kesekî re li hev jî bêyî."

Min got: "Ez nuha ji bo ser wextbûnê amade me, dê ka ji min re bibêje".



Wî ji min pirsî: "Ma dibe ku mezintirîn Serdar, heyv be?".

Min got: "Na"

"Ji bo çi?"

"Ji ber ku me piştî wê roj dît."

"Yekbaska min, ma dibe hîn pir hêzên din hebin ku em wan nas nakin?"

"Belê dibe hebin."

"Ma em dê çawa serwextî rewşa tiştên nenas bibin?"

"Bîlgeyê min em dê çawa serwext bin?"

"Bi zamînê meriv serwext dibe, Yekbaska min. Lê divê pêşî em yekîtîya xwe pêk bînin. Ma ev ne rast e? Dema ez û tu jî li hev nekin..."

"Ma nuha em bûn çend heval?"

"Tu, ez, pezkovî, Heyv, Roj jî."

Bîlge ramiya. Bêhna wî hatibû ber


Wî got: "Ez ê pirseke dîtir ji te bikim. Ma dibe ku Nemrûd nemir be?"

Bê ku biramim, min got "na".

Heval Bîlge ji cîhê xwe rabû. Bivirê xwe bi sitûyê pûtekî ku neşikandibû bi darve kir. Piştre çav li min şikand. Bi rastî wê gavê ez tênegihiştibûm dixwaza çi dike. Her tişt piştî Nemrûd ji şahiyê vegeriya bû. Ez jî baş serwextî hertiştî bûm.

Saraya Nemrûd, ew çend mezin bû ku çiyayê mezin ê bin wê wenda bûbû û kesekî nizabibû saray li ser çiyakî ava bûye.

Li gora gotinan bi qasî hejmara mêşên hungiv ên vê cîhanê, zêr, încî û yaqûtên wî hebûye. Cîyê xezîna wî di nava



çiyakî de buyê û suwariyên bi sîng li ber wê bûne. Li cîhê xezînê hin caran parezgeran bi hev re hesp jî bezandine.

Li pêşîya saraya Nemrûd meydaneke mezin, pir mezin hebû. Nemrûd derket ber deriyê sarayê. Li ser laş û li dara serê wî, mîna nanikên hungiv ên moz çêdikin, zirxên ku bi hunermendî hatibûn çêkirin, hebûn. Milekî xwe bilind kir, bi rabûna milê wî re, bi sedan, bi hezaran qûlên wî, li ber wî xwar bûn û daketin ser dest û piyan.

Nemrûd dîn û har bû.

Got: "Hey xwe nezanê bê şeref, ma te pût şikandin?"

Min li nav herdû milên Bîlgê cîh girtibû, baskê xwe ê tenê jî xistibû bin zikê xwe û dipam. Bîlge gavek avêt û derket pêş.

Bi qerf lê vegerand: "Bivir di stûyê kê de be, wî pût şikandine".

Nemrûd jî gavek avêt pêş. Ji hêrsa wî, kevir û zînar lerizîn.

Got: "Bivir di situyê pûtekî de ye. Lê pût nikare pûtan bişikîne. Ma dê çawa bimeşe? Dê çawa destên xwe bilind bike û bivir li pûtan bixe?


Destbirakê min Bîlge, li destbiraka me ya Rojê nêrî. Germiya Rojê her der kiribû wek êgir çav li Rojê şikand, piştre bi qasî ku xelk bikaribin bibihîsin bi dengekî bilind peyivî.

"Mafir waha ye, çima hûn bi van pûtên ku kêrî tiştekî nayên baweriya xwe dînin?".

Nemrûd hay li çewtiya xwe bû û xwest li ber xelkê rewşa xwe biparêze.

Gotê: "Tu ifridek î. Heqê te di nav êgir de şewitîn e. Ev kir ji gelê min re jî dê bibe aqil."

Xweziya xwe daqûrtand. Bîlge serê xwe ê bilind xwar nekir û gotê: "Ez ji êgir natirsim. Tenê bera xelk fêrî ramiya



an û yekitiyê bibe."

Nemrûd li xelkê nêrî. Hîna li ser çarpîyan dipan. Bi xurtiya baweriya ku xelk bi wî ve girêdayi ye qîriya:

"Gelê min, min, nuha ez yekîtiya we, ji bo vêxistina mezintirîn agirê cîhanê dixwazim. Mezintirîn agirê cîhanê... Ev kesê ku li ber me serî hildaye dê tê de bête şewitandin..."

Min baskê xwe ê tenê ji bin xwe kişand. Ji nav milên Bîlge firiyam, çûm, min xwe li ser serê wî danî."

Min gotê: "Ez jî dê bi te re bişewitim."

"Em dê bişewitin, lê dema xweliya me li nav welatê Nemrûd belav bû, dibe ku tiştek çêbibe, Yekbaska min".

Bîlge avêtin zîndanê. Ez jî bi wî re ketim, zîndanê. Hundirê wê pir tarî bû. Rengê wê şikefta ku cara pêşî me hev tê de dîtibû û bi salan em tê de bi hev re jiyabûn dida. Pencereyek zîndanê a biçûk hêbû. Destbirakê me Roj çûbû ava. Çima îşev heyv derneketibû.? Gelo agahdarî tiştên ku hatibûn serê me bûbû, û şîn girtibû? Ya pezkovîya me? Qet nebûna nuha ew derketa û bihata...


Bilge, di nav zîndanê de dest bi çûnhatinê kir, tiştekî ku me bikira tunebû. Haya ma ji bûyerên derve ne dibû.

Bîlge got: "Yekbaska min, de rabe di vê pencerê re bifire û here derve. Tiştên ku bibînî were yeko yeko ji min re bibêje."

Ji bo bicîhanîna fermana wî, ez bi dil û can firiyam û çûm derve. Te digot qey baskekî min ne kêm bû û weke ku hezar baskên min hebûn.

Pêşî li dora sarayê çûm û hatim. Ji hundir dengê kenê wan dihat. Dengê ku pirtir dihat bihîstin ê Nemrûd bû.

Wî digot: "Bera sibe agir vêkeve." Piştî qedandina gotina xwe, bi wî awayî dikeniya, ku ji kişandina bêhna wî, perdeyê sîmîn dilerizîn.



Ez ber bi cihê agirê ku dê pêketana firiyam. Gasina pêşiya sarayê wenda bûbû. Êzingên civandî mîna çiyakî xûya dibûn. Ji çiyayên hember, zincîra rohniyên gah pêketî û gah vemirî barên êzingan ên dawî jî dikişand gasina bajêr. Ser pişta hesp, belgir û bi êzingên ku Bilgê dê pê bihata şewitandin, dagirtî bû. Gava ku ez dê vegeriyama zîndanê, agir pêxistin. Weke ku dest biraka me roj, ji ezmên daxistiyî erdê bûbû, bi qije qij dişewitî û ji hev diket. Berî hungûra sibê xelk bi rohniyeke pir germ daketin kolanan. Min jî ji bo bazkê min ê mayî neşewite ji tirsa xwe avêt zîndanê.

Hundirê zîndanê jî rohnî bûbû.

Min got: "Ro ji ezmên daxistine jêr".

Bîlgê gote min: "Ji derketina tavê re hîn pir heye, xuya ye agir pêxistin."

Serê min di ber min de, min got: "Belê"

Pir derbas ne bûbû û deriyê zîndanê vebû. Du leşker ketin hundur. Ew du serbazên mezin bûn. Bi teldan destbirakê min Bîlge ji zîndanê derxistin derve, çavên herkesî ji rohniya agirê ku bi qirçeqiç dişewitî dihate girtin.


Em birin ber Nemrûd. Xelk li dora êgir kom bûbû. Ji bo dîtina tiştên ku dê bibin hevudu tot didan.

"Hey isyankarê dijminê gel, bi gotineke min, daristan li vir kom bûn. Bi gotina duduyan jî tu dê bibî xwelî. Lê heger tu poşmam bibî û pûtên şikestî weke berê bikî yan jî ji nuh ve pûtan çêbikî, ez ê te biborînim û te bikim serekê pûtên xwe. De ka bibêje, ma li erd û ezmanan kesekî ji min mezintir heye?"

Ez firiyam çûm, min xwe li ber guhê destbirakê xwe Bîlge danî.

Min gotê: "Heye ne waha? Yekîtî..."

Bîlge bişirî û bi dengekî nizm ji min re got:



"Yekîtî jî têr nake. Ji bîr meke em hîn li nîvê rê ne... Ma yekîtiyeke çawa? A girîng ev e.

Dûre berê xwe da Nemrûd û bi dengekî ku herkes bibihîse qîriya:

"Agirê te min natirsîne. Tu û pûtên te bi hev re nemînin!"

Nemrûd bû wek dinan. Ferman da:

"Wî bavîjin nav êgir!..."

Min ji Bîlge re got: "Ez jî bi te re me". Weke min berê jî gotibû, bê ku riya gotinê bidinê, bi totdan Bîlge ber bi êgir de birin.

Di vê navê de tiştekî ne payî pêkhat. Agirê pêxistî ewçend xurt bû, ku kesek nikaribû nêzikî wî bibe û Bîlge bavêje nav. Serleşker ji bo xwe bi Nemrûd şêrîn bikin xwe dan pêş. Lê bêçare bû. Guriya êgir davêt zirxên wan jî. Hinekî dereng bimana ew û zirxên wan dê bi hev re bibûna xwelî.

Wezîr bi bazdan çû nik Nemrûd û gotê:

"Ey Serdarê Serdaran min çareya vî tiştî peyda kir".

Nemrûd bi qîrîn gotê: "De zû bibêje melûn!..."

"Divê li jora sarayê em du sitûnan çêbikin. Piştre bi benekî, mîna hêlanê herdu stûnan bi hev girêdin û Bîlgeyê xiniz bavêjin nava êgir."

Ji dêvila ku tesira êgir kêm bibûna û derûdora wî teng bibûna, agir geş dibû. Ji pejirandina pêşniyariya wezîr pêde tu rê li ber wan nemabû.

Nemrûd ferman da."Sitûnan ava bikin!."

Pir derbas nebû îcar xelkê, bala xwe da timika sarayê û li wê nêrî. Bîlge derxistin ser sarayê. Bi lez ew xistin nav hêlekanê û avêtin nav êgir. Hevalê min li ezmanan diqîriya û digot:

"Yekbaska min tu meyê, hîn li jor tu dê bibî kebab".



Ew firiya nav êgir, ez jî cihekî dûr...

Nizanim, ez çuqasî firiyam. Bi bihîstina dengan ez li paş xwe vegerîyam. Germa bihîstika din a mîna kura êgir cihê xwe dabû hewa baharê a nerm. Min got qey ez mirî me. Min dê xwe bavête erdê: Baş bû ku min xwe ne avêtibû. Ji ber ku xelkê pir ê ku li dora êgir bûn, direviyan. Pir derbas nebû ez serxwextê haya rev xelkê bûm: Wan dipa ku Bîlge bikeve nava êgir, lê ew ketibû ser cihekî mîna hevrîşimnerm. Ew agirê pêketî hebû ya, ew agir, nuha bûbû aveke zelal, diherîkî. Êzing û bizot jî bûbû masiyên rengareng!... Bi heyret û kêfxweşî firiyam çûm, min xwe li nav milên Bîlge danî.

Min gotê "Li bextiyariyê binêre. Tu nemirî?. Ma ev çi ye diqewime?".

Bîlge jî şaş mabû. Go: "keramet e".

Min jî baskê xwe bilind kir û gotê "keramet e."

Pir derbas nebû, heşê Bîlge hat serê wî û got:

"Kêfa bi kerametan hîç û pûç e. Xuya ye hin listikên nuh ku dê werin serê me hene."

Min got: "Tu nemirî. Tu sax î û agir jî bû av. Ma hîn tu çi dixwazî?"

Wî got: "Ax tekbaska min, bala xwe bide xelkê, çawa şaş mane!... bi kerametan bawerî anîn ji wan re çend hêsan tê".

Min ji wî pirsî: "Nuha dê çi bibe?"

Wî got: "Bêhna xwe fireh bike. Em dê nuha bibînin. Lê ji bîra meke, ji me pirtir Nemrûd dê ji vî karî destkewtî bibe."

Li Nemrûd dinêrî. Nemrûd bûbû mîna dînan. Ew Nemrûdê ji ezmanan baran dibarand, goya xedayê ezmanan dikûşt bûbû miroveki bi can ê basît. Bûbû lê, serî li ber vê serneketina ku hoyê wê ne dihat zanîn, xwar nedikir.

Bang kir "leşkerên min."



Xelkên reviyayî nema dizanibûn ka gelo li ba Nemrûd cîh bigirin yan li ba Bîlge.

Lê ew dengê ha û gotina ha, têra tirsandina xelkê kir û zêde jî bû. Serî li ber xwediyê ordiyê xwar kirin.

Li ber siya herdû milên Nemrûd ên ku rabûbûn ezınanan destpençê xwe xwar kirin. Serleşkeran ji Nemrûd re xweş kirin.

Gotin: "Serdarê ıne, fermana te ji şûr tûjtir, ji ınû ziravtir e.

Bîlge ji bo ku neşewitibû, li çogên xwe dixistin.

Min got: "Tu saxî ya Bîlgeyê min. Ma tu li ber çi dikevî."

Wî got: Keramet ax ev keramet nebûna. Agir agir e. Av av e. Ez bişewitiyama dê baştir bibûna. Hebûna Heyv û Rojê ne keramet in. A rastî diviyabû ez bişewitiyaına. Heger ez bişewitiyama, agir nebûna av, êzing nebûna masî em dê biserketana. Lê ma nuha?"

Ji nav milên wî firiyam. Min xwe li ser destekî wî danî. Destê ku min xwe li ser danibû xwest bibe ber devê xwe û di guhê min de tiştekî bibêje:

Min gotê: "Bibêje ına tênegihiştin şerm e?"

Wî got: "Binêre Yekbaska min. Ez zarokekî ku ji ber tirsa Nemrûd hatime avêtin. Ma ev derew e?"

"Rast e."

"Bazkekî te qutbûye."

"Ê"?"

"Ma hîn tiştekî din heye Yekbaska min... Tevî vê rewşa me jî, heger agirê bîstika din pêxistibin, evyek dikaribû xelk serwextî tirsa Nemrûd û gav avêtina wî a bi paş de bikirana. Lê êdî xelk ne li ser me, dê li ser kerametê bipeyive."

"Ma divê ein çi bikin?"

"Ez jî nizanim. Lê berî me, ji bo xurtkirina desthilata xwe, Nemrûd dê bixwaze dekeke nuh pêkbîne."



"Na ev jî kî ne Bîlge?"
"Serbazên Nemrûd in. Divê li ber cihî tu wan, ji serê wan ê mezin nas bikî..."
"Ma çima serê serbazan mezin e Bîlge?"
"Ez bawer dikim, ji ber pir dixwin û hindikî diramin."
"Serbazên min!"
Serbazan sitûyên xwe ên qalin dirêj kirin.
"Fermo serdarê me."
"Li ber çavên gelê min, hûn dê bi Bîlge re şer bikin."
Ji ser destê Bîlge firiyam çûm, careke din min xwe li nav milên wî danî. Serbazan pêşî xwestin bi ya Nemrûd nekin."
"Lê Serdarê me, ma dibe ku ordiyeke ew çend bi rêkûpêk û mezin bi mirovekî re şer bike?"
Bi şalafî gotin." Ma heya tu hebî, ramiyan û têgihiştin ji me re dikeve?"
"Ger waha ye, dê ez bivînim, li ser çogan destbest bin."
Serbaz daketin ser çogan û gotin:
"Fermana te li ser serê me."
Nemrût got: "Bîlge jî pût jî bera nemînin. A girîng ku em hêvî û baweriya xelkê bi xwe xurtir bikin. Divê li meydana serpireziyê cendekê Bîlgê bibe parî-parî."
Serekê serbazan careke din xwe negirt û pirsî:
"Ma li hember mirovekî ordiya me bi hêz û bi rêkupêk dê şer bike?"
Nemrûd got: Ne tu bî ne serleşkeriya te be. Kuştina merivekî ne girîng e, a girîng ew e ku mîna rojên cejnan em hêza xwe xûya bikin û xelkê çavtirsandî bikin."
Serekê serbazan jî got: "Armanca me çavtirsandina xelkê ye."
"Sibe li meydana serfiraziyê ceng dê bête kirin."
"Ceng dê bête kirin Serdarê me".
Nemrûd bi rik li Bîlgê nêrî.
"Sibê tu dê bêyî kuştin."



Bîlge bêdeng ma. Kûr kûr li Nemrûd, li serbazan û li xelkê nêrî.

Hespê Nemrûd ê belek anîn. Piyên hespê ew çend dirêj bûn ku ji bo Nemrûd bikaribe suwar bibe, serbazan hevudin tat didan, da ku xwe li ber zengoyê hespê xwar bikin. Serbazê suwariyan ji hemiyan zûtir xwe xwar kir. Nemrûd pêl pişta wî kir û li hespê suwar bû. Nuha ew ji herkesî bilintir bûbû. Gema hespê xwe kişand. Hesp rabû ser piyan.

Bi qîrîn got: "Hey gelê min, hûn dê sibê bên Meydana Serfiraziyê. Divê careke din hûn bi çavên xwe hêza min û a ordiya min bibînin."

Hemwelatiyên Nemrûd serwextî rewşê nedibûn, bi a wî kirin û belav bûn.

Di vê navê de Bîlge jî avêtibûn zîndanê.


Pirsa ku hatibû serê zimanê min ê ji mû ziravtir, min ji Bîlge kir. Min gotê: "Bîlgeyê min, tu pir tiştan dizanî. Ma ev çawa dibe?"

Bişirî û got: "Gava meriv bawer bike ku mezinên wî, ji bo wî diramin û ew her tiştên baş ji bo wî dixwazin ji koletiyê rizgar nabe. Dibe ji ber ku di şikeftê de jîyam, ez fêr bûm ku ji tiştên heyî ê sazbûyî şik bikim. Gava ji şikeftê derdiketim û vedigeriyam, carekê dijiyam, hezar caran diramiyan.

Her ku ramiyam, dûrî piraniya kesên ku mîna keriyê pez dihatin ajotin, ketin. Ji ber dûrî wan ketim jî ez bi ê heyî têr nebûm. Li tiştê ku dikare bibe geriyam. Min berê jî gotibû, divê meriv carekê bibîne, hezar caran birame. Carekê bixwîne, hezar caran birame...

Heya sibê ez li ser gotinên Bîlgê ramiyam. Dibe ku wê şevê ez serwextî giringîya guhdarîkirina carekê û ramiyana hezar caran bûm.

Destê sibê hatin ber deriyê zîndanê. Em herdu jî ne razayî bûn. Min got: "Mirin hat".



Bîlge bêdeng bû.

Got: "Bera bê, mirin ji jiyana koletîyê çêtir e., Lê divê tu têkilî vî karî nebî."

Min gotê: "Ma dibe? Ma tiştên waha jî dibe Bîlge? Ma piştî mirina te ez dikarim bijîm...?"

Got "Divê tu bijî. Divê tu tiştên bûyî bibêjî."

Min pirsî "ji kê re?"

Derîyê zîndanê ê ku kilît li ser kilîtê kiribûn vebû. Du çêkdar derbasî hundur bûn. Di destê yekî de fînd pêdiket.

Bîlge pirsî: "Te got ji kê re?"

Min gotê: "Belê ji kê re?"

"Ji mêşên hunguv re... Ew ewçend pir in ku... Xwezî wan hev bigirta."

"Mêşên hungiv!"

"Belê mêşên hungiv... ew mêşên piçûk... Ew jî mîna gel in. Yeko yeko bê hêz in. Lê dema dibin yek..."

"Ma çawa Bîlgeyê min?"


"Mîna avê... Ev ava ku em dizanin. Av pêşî dilop dilop e. Dibe çuhek, dibe çem û dibe rûbar... Dibe rûbar û tevlî deryayan dibe. Ma derya ne ji avê pêkhatiye?"

Li nav milên Bîlge ji zîndanê derketim. Derve rohnayî bû. Destbiraka me, Roj ji zû ve ji pişt çiyan bilind bûbû. Min li wê nêrî. Ma gelo wê dê bikaribûna tiştekî bike?. Min, Bîlgeşanî wê da û ji wê re çav şikand. Di wê navê de perçeyek ewir hat ket ber wê. Rohniya wê kêm bûbû. Gelo bi wî awayî dixwest diltengiya xwe diyar bike? Hîn, ez li ser tiştên ku vê dawiyê Bîlge gotibû diramiyam.


Em di nav leşkerên çek bi singa de dimeşiyan. Ên ku çav li Bîlge diketin hev diniquçandin û ji hev re tiştek digotin.

Ez firiyam, ketim nava wan. Min, ew tiştên ku wan ji hev re digotin hemî bihîstin.

"Ev ocaxek e. Ma agirê Nemrûd çawa bû av."



"Masî"
"Pir biçûk e jî"
"Zanabûn ne bi mezinayi û biçûkayî ye. Ji mejî ye."
Yekî din jî waha diqîriya.
"Ev tişt hemî ji bo pesirandina nemirbûna Nemrûdê me ê nemir e. Hûn ne bi agirê ku bû av, ne jî bi vî ifritî bixapin... Hûn de bibîmin ku bîstik din dê çawa bibe piçuparî."
"Mirin!..."
"Naa."
"Ocaxek!"
"Kes ji Nemrûd ne ocaxtir e."
"Hevalno dev ji peyv û raberizinê berdin divê em bi wext bigihên meydana serfiraziyê."
Bi lez û bez ber bi Meydanê ve meşiyan.
Di riyên teng de firiyam, dema gihaştim Meydana Serfiraziyê bêhna min çikiya bû. Min digot qey bazkê min ê mayî jî dê jê bibe. Bi zor di ser serê leşkerê Nemrûd re difiriyam. Di destên leşkeran de sing û mirtal hebûn. Leşker, ji mêşên sed, hezar, deh hezar caran pirtir bûn. Bi deqiqan firiyam. Lê dawiya leşker ne dihat. Ji nişka ve tirsa ku ez negihêm ser Bîlgê ket dilê min û ez waha tirsiyam ku... Ji bêhêzî çi nemabû bikevim erdê. Ji bo berdana bêhna xwe min xwe li serê rima leşkerekî danî. Serbazê wî çend bi hêrs bû.
Ji ê nêzîkî xwe re digot: "Xezî serdarê me, destûra min bidana, min dê bi tena xwe û bi destên xwe, evê ku serhildaye bikuşta!..."
Yekî din di pirsî: " a gelo em dê çawa wî bikujin?"
"Li gora min bihîstiye, derba pêşî, Nemrûd dê lêbixe. Paşê hemî serbaz... Leşker jî dê yeko yeko rimên xwe di laşê wî de biçikînin. Laşê wî jî ji bo bibe piçûparî dê ji xelk



kê re bête avêtin."

Bêhna min hatibû ber min. Careke din di ser leşker re firiyam. Bi carekê meydaneke vala hat ber min. Bîlge hinekî ji min wêdetir bû. Bi tena xwe li pêşberî leşkerê Nemrûd rawestiyabû. Dîsa min xwe li ser destekî wî danî. Me li hev nêrî. Bi hezkirin destê xwe di baskê min ê tenê da. Çavên me ji hêsiran tije bûn.

Got: Dema xatir xwestinê hat. Lê tiştek heye ku min şaş dihêle..

Min pirsî: "Ma çi te şaş dihêle Bîlge?"

Got: "Li vê ordiyê binhêre, çawa xurt û bi xizmet e. Lê li xelkê jî binêre... Perîşan bêjî pêrîşan. Tu..."

Bîlge gotina xwe temam nekir.

Bi carekê ve leşker bû du bir. Ji valayiya nava wan Nemrûd diyarbû. Vê carê li hespeke sipî siwar bûbû. Hesp dihiriya û radibû ser piyan. Di nav leşkerên ku û mirtalên destên wan li ezmanan bû, Nemrûd ew çend bi şanazî û qudretî derbas dibû ku, bi rastî, mirov digot qey wî bi xwe erd û ezman afirandibû.

Min got: "Nemrûd tê"

Wî got: "Ez jî dibînim."

Min gotê: "Guh bide Bîlgeyê min. Ma tu dizanî ku evçend roj in ez çi diramim?... Ma ne te gotibû carekê bibîne, bixwîne û hezar caran birame?"

"De zû bibêje yekbaska min ka tu çi ramiyayî? Wextê me pir kêm ma. Hindik maye Nemrûd bigihê pêşiya ordiyê"

"Ma mêşên hungiv dikarin bibin yek?"

"Wey tu dîn bûyî yekbaska min? Ma tu nabînî Nemrûd nêzîkî me bû. Em ji hev xatir bixwazin dê baştir be."

Pêşî, min li Nemrûdê ku ber bi me de dihat nêrî, paşê li leşker û xelkê temaşegêr nêrî. Piştre min got dibe ku careke din nikaribim wî bibînim ez firiyam çûm, min xwe li ser hinarkên rûyê Bîlgê dan. Maçek ji hunguv şêrîntir min jê

girt.

Destbiraka me Roj ber bi nivê ezmên de bilind dibû. Nemrûd hat, li pêşiya ordiya xwe rawestiya. Ew û Bîlge dûrî hev bûn. Bi qirîn gotê:


"Ez dê ji te re keyseke din bidim. Heger tu li ber min destbesteyî dakevî ser çogan ez dê te biborînim. Lê heger li ber xwe bidî..."

Ji ber ez ber bi hevalên xwe de difiriyam, nizanim Nemrûd çawa gotina xwe girêda. Ez mêşeke hungiv bûm. Min nikaribû xelk serwext bikira lê min bi hêsanî dikaribû birayên xwe mêşên hungiv serwext bikim. Dema gîhaştim ber devê kewara xwe, ji xwe pir bawer bûm ku ez dê bikaribim alîkariya Bîlge bikim. Ma ez girîngiya bi xwebawerbûnê ji wî fêr nebûbûm? Ne ji ber bi xwebawerbûnê ye ku nuha ew li pêşberî leşkerê Nemrûd ê bi navûdeng û rêkûpêk li ber xwe dide? Dibe ku a nuha Nemrûd, li pêş e û diçin ser wî. Bêşik Bîlge xwe nade paş. Gelo a nuha ordî di rewşa şer de xoşxwan dixwend? Û berbî wî ve diçû? Divê berî ku ew bête kuştin, ez xwe bigihînimê. Nuha dema pêkanîna tiştê ku ev çend roj in ez çel caran divêjim û carekê dibirim, carekê dibihîsim hezar caran diramim, hatiye Kewara pêşî a ku min pê re pêwendî danî û me li hev kir, kewara min bû.

Min digot: "Deng ji destê bi tenê, dernayê".

Dipirsîn: "Hevalo, ma dikeve serê te ku em serfiraz bibin"?

Min got: "Ma heger em serfiraz nebin, em dê çi wenda bikin. Lê gava em serfiraz bibin jî... Serfirazîya me ne tenê ji bo heywanan, ji bo mirovan jî dê bibe dersek. Dema temaşegêr, me li nik Bîlgeyê ku nuha bi tena xwe li pêşberî Nemrûd rawestiyaye, bibînin, dê şaş bibin. Dema şaş bibin jî, dê ji me ders bigirin û di nav xwe de bipeyivin. Dê bipeyivin û biramin..."



Pêşniyariya min ket serê wan jî. Me karê xwe parve kir. Her mêşek bê ku hayê makê bigihêniyê dê biçûna kenarên din û ew birêxistana.

Di demeke kurt de tiştê ez li ser diramiyam pêk hat. Em bi milyonan mêş, ber bi meydana Serfiraziyê de firiyan. Tevî ku ez bi baskekî tenê bûm jî, wan ez kirim serleşker. Bi baskê xwe ê tenê ez, li pêşiya hemiyan difiriyam. Min nikaribû Bîlgeyê xwe tenê bihîştana.

Destbiraka me Rojê jî alîkariya me dikir. Ji paş de bayekî waha li me rakiribû ku em ji çûkan bezatir bûbûn.

Gava em gîhaştin Meydan Serfiraziyê, min Nemrûd ê hildayî dît.

Bi qîrîn min got: "Berê xwe bidin suwarê hespê boz".

Bi mîlyonan birayên minî mêş, pêşî êrîşî Nemrûd, piştre jî êrîşî leşkerên wî kirin. Leşker bêyî ku bizanibin çi bi wan hat, belav bûn, ji ber hev ketin û bi paş de reviyan.

Min xwe gîhand Bîlge. Rê neket destên min ku li nav milên wî dabezim. Min bi qirîn gotê:

"Merheba birako!"

Wî jî got: "Li ser çavan Yekbaska min."

Xelk şaş mabû. Bi çavên xwe dîtibûn, biçûk bin jî , gava bi mîlyonan mêş hev bigrin, çawa dikarin ordîyeke bi rêkûpêk ji hev bixin. Di nav hev de peyivîn., Pêşî yek, paşê hezar, dawiyê jî ji hezarî pirtir kes daketin qada cengê. Ew jî li rex me beşdarî şer bûn. Bi rastî heşê mirov nagihê karê xelkê. Tu nabêjî li hember Nemrûd û leşkerê wî çend bi rik dagirtî bûn...

Leşkerên bi sing û mirtal, direviyan, ew diketin erdê jî di bin piyan de dihelîsîn. Di vê navê de çavên min bi Nemrûd ketin. Ser çav û rûyê wî tije mêş bûbû. Ber xwe nedidît. Bê ku ber xwe bibîne hespê xwe dajot vî alî, wî alîyî.

Min ji Bîlgê pirsî: "A nuha?"

Got: "Nemrûd li ser te. Piştî mêş û ên ku ji xelkê tevî me



bûne, bi hêsanî em dê zora ordiyê bibin."

Min berê xwe da Nemrûd. Heger dijmin ne Nemrûd bûna, bi rastî bi baskê xwe ê tenê min nikaribû ewçend bifiriyama.

Min ji xwe re digot: "li ber xwe bide yekbaskê. Li ber xwe bide. Zorê bide xwe."

Li ber deriyê sarayê min ew girt. Bi qasî ku çavê xwe bigrî û vekî peya bû. Berê xwe da odaya xwe a hesinî. Dema ku min dê xwe bigihandanayê, derî li ser xwe kilît kir. Nemrûd ji destê min filitî bû. Li ber derî him min bêhana xwe berda, him jî ramiyam: Min dê çawa Nemrûd bikuşta? Dema rawestinê nebû. Dîsa firiyam. Min temaşeyî odeyê ku Nemrûd tê de veşartîbû, kir. Çarmedor ji hesin çêbûbû. Bi top û tifingan meriv nikaribû bikeve hundur. Piştre min rê dît. Nemrûd kunek ji bîr kiribû. Ew jî kuna kilitê bû. Di wê re jî, tenê mêşeke hungiv dikaribû derbas bibe. Him jî mêşeke yekbaskî.

Ez derbasî hundur bûm. Nemrûd ne ez diditim ne jî dengê min dibihîst. Bala wî li ser şerê derve bû. Heşê wî li ser bi mîlyonan mêşên hunguv ên ku bûbûn hoya serneketina ordiya wî. Dîsa jî dilê wî bi nemirina wî xweş dibû.

Min xwe li ser finddaneke zîvînî danî.

"Yekbaskê carekê binêre, hezar caran birame. "Min got ji xwe re." Bi mêşbûna xwe, tu dê çawa wî xinizî bikujî?"

Min xwest herim bi hezaran, deh hezaran mêşên heval, du kuna kilitê re, a ku ez tê re derbas bûbûm, bînim odê. Lê paşê ramiyam û ji cihê xwe firiyam. Bêdeng û bi bez ji pozê Nemrûd ketim hundur û ber bi nava serê wî ve ketim rê.

Nemrûd ji êşan dîn bûbû. Deriyê oda hesinî, ê ku ji paş de kilit kiribû vekir û derket derve. Şerê nava leşkerê wî û mêşan bi bêşdariya hinek kesên ji gel, hîn berdewam dikir. Bi qirîn got:



"Serbazên min, wezirên min werin alîkariya min!.."
Piraniya serbazên wî miribûn, ên mayî jî bi milyonan mêş re, li ber hev didan. Her ku Nemrûd dibeziya, her ku Nemrûd diqîriya ez jî di hundirê serê wî de gir dibûm. Di demeke kurt de bûm hechecikekî mezin. Her ku min baskên xwe li hev dixistin, Nemrûd ji êşan dîn dibû.
"Min xelas bikin. Xelas bikin. Bera serdariya min ji we re be, tenê wî çûkê ku di hundirê serê min de difire, derxînin."
Min ji xwe re digot: "Xwezî, xelkê lav-lava ew Nemrûdê ku bi nemirî dihat zanîn, bidîta."
Bi carekê tirsek ket dilê min. Ma bi rastî ez dê di nav serê vî serdarê ximiz de bijiyama. Bê dîtina Bîlge, Roj, Heyv, û birayên xwe yî mêş ma jiyan ji çi re bû?...
Çend serbazên ku ji meydana cengê reviyabû, xwestin alîkarîya wî bikin. Ji text mîrkutek çêkirin û pê li serê wî xistin. Her ku mîrkut lêdiket mîna darekî ku tu wî bi erdê de bikutî Nemrûd biçûk dibû. Ên ku serê wî dikutan, him lêdixistin him jî dipeyivîn.
"Serdarê me, li cîhanê çiqas mêşên hungiv hebûne"
"Ax ne mêş bin."
"Serdarê me xelk jî ketin nav şer."..
"Ax ...lêxe...Hîn xurtir lêxe... ên ketin şer jî nemînin..."
Bi lez mîrkutekî din jî çêkirin. Bi rêz lêxistin.
Lê êşa Nemrûd nedişikest.
Ji nişka ve serbazekî bi qirîn got:
"Min peyda kir!..."
Nemrûd bi axîn got "zû bêje"
Got: "Serdarê me ê nemir ji te re serîkî din divê. Çawa be tu namirî. Em vî seriyî jêbikin û yekî nuh deynin ciyê wî..."
"Te got yekî nuh?"
"Serdarê me yekî nuh."

Nemrûd baweriya xwe bi vê pêşniyariyê neanî. Lê her ku min baskên xwe li hev dixistin ji êşan dimir. Ji bêçareyî sitûyê xwe dirêj kir.

Got: "Baş e. Lê divê ê nuh, ji vî serê min çêtir be."

Hema li wir Nemrûd dirêj kirin û serê wî jêkirin. Bi jêkirina serê wî re, min jî baskên xwe vekirin û berbi Bîlge ve firiyam.

Leşkerê Nemrûd ê bi rêkûpêk, li ber êrişa mêşan şikestibû. Dengê ên ku direviyan, digiriyan û diqîriyan digîhaşt çiyayê dora Meydana Serfiraziyê û vedida.

Min xwe li nav milên Bîlgê danî.

Min gotê: "Li me pîroz be. Min Nemrût kuşt."

Bîlge, ji nav milê xwe ez girtim nav destên xwe çavên min maç kirin.


Bi dilgermî destê xwe li ser perîkên biriqandî ên baskên min bir û anî. Piştî rawestîna destê wî, min jî baskên xwe vekirin û jê re pateyek avêt. Bi dengekî kelgirî daxwaza xwe a dawî ji min re got:

"Hechecika min a ku ji mêşa min a hungiv a xweşkok û yekbaskî çêbûye. De haydê êdî ber bi welatên din de bifire. Û ji zarokên ku rastî te hatin, ji wan re vê çîrokê bibêje."

Ber bi rojê ve firiyam. Dema lê vegeriyam û min li wî nêrî, destê xwe ji min re dihejand. Bi çavên xwe ên bi hêsir, min carekê li Bîlge carekê jî li mêşên ku vedigeriyan kewarên xwe nêrî. Heger daxwaza Bîlge a dawî nehatana bîra min, min dê xwe negirta û ez dê daketama jêr.

"Û ji zarokên ku te dîtin re, vê çîrokê bibêje..."

Zarokno nuha ez li welatê we me.



**Weşanxana Çanda Kurdî**

ISBN 91 861 46 32 7